

Dizên berê jî, ne weke yên vê demê bûn

Rêberê Silivî

Hê jî, weke xewnekê tê bîra min, buhuştî **Seyid Hesenê Bêcirmanî** ku hevlekî bavê min bû, gelek caran ew dihate şevbuhêrka me, çîrok û serpêhatiyên bav û bîran ji civatê re digotin. Yek ji wan jî ev bû:

Li gundekî ji gundên kurdan, ji nişka ve gayê cot ê mirovekî winda bû. Kesî nizanîbû gelo ew hatiye dizîn yan jî gur û keftar rastî wî hatine û ew xwarine. Dilê mêrik li gundiyekî wî xira bû ku wî gayê wî dizî be. Rabû çû mala wî, di navbera xwe û wî de jê re got: Bira, ez çiqasî didime hişê xwe, ez dibêjim ji te pêve kesî Ga yê minî reş ne biriye, vêca eger te biribe, ji kerema xwe re bê sergêjî wî vegeirîne cihê wî, bera dilê te di cih de be, ez ji kesekî re jî nabêjim. Mêrik, yek ne kir dido, yekser diziya Gê da mendelê. Xwediyê Gê jê pirsî: Tê înanîya min bînî, tê li ser destê Melê sûnd bixwî?. Wî erê kir û xwe da ber sûndê.

Ji ber ku dema berê Mela li her gundekî nebûn, divabû qonaxa şev û rojekê bi rê ve herin. Serê sibehê, herduwan da kêleka hev û berê xwe dane gundê ku Mele lê hebû. Li wan bû şev, herdu westiya ne, tî û birçî bûne. Xwe berdane gundekî, li deriyê malekê xistin û li wê malê bûne mêvan. Dîn û bala xwe dane xwediyê malê, çawa ew dilezîne hema livînan

ji wan re radixîne û ji wan dixwaze ku bi lez razên, bê ji wan bipirse ka ew têr yan birçî ne. Wan jî dilê xwe bi hatina sibê xweş dikir, ji xwe re digotin, sibe emê rabin têr taştê bixun û bidine ser riya xwe.

Berbangê, xwediyê malê mêvanên xwe şiyar kirin, ji wan re got nimêja xwe bikin da hun biçin, ji ber ku riya we pir dûr e. Piştî nimêjê, mêrik û kufletê xwe nîska germ ji xwe re rû kirin leganekê, nan çandinê, bê ku ji mêvanên xwe re pêşkêş bikin û dest bi xwarinê kirin.

Herdu mêvanên birçî matmayî li hev nerîn, rabûn birçî ji wê malê derketin û dilşikestî dane ser riya xwe. Piştî ku hinekî bi rê ve çûn, xwediyê Gê ji mêrik re got: Bira, bi xwedê hema ez û te emê li vir ji hev xilas bibin, em naçine cem Melê, tevî ku ez dizanim û bawerim te gayê min biriye, lê hema tu ji min re bibêje ez weke vî mirovê ku em birçî ji mala xwe derxistine, bila Gayê min sed carî li te pîroz be. Mêrik da hişê xwe, ponijî, xwe da vî alî, da wî alî, got: Bira, bi xwedê bera ez bimirim û ne weke vî mirovê pîs ê çavteng bim. Gayê te li ba min e, min ew li cem hevlekî xwe veşartîye, haydê em herin gundê hevsînorê me da tu Gayê xwe bibî!!...

12-06-2008